



Serkomarê Kurd
Qazî Mihemed
namire >>>> R:5



Peyama Navenda
Hevkarî ya Par-
tiyên Kurdistan
Îranê derheq 10`ê



Xakelêweyê

>>>> R:4

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (347)04-04-2019 Buha (1000) Tûmen

Siberoja
HSD`ê
piştî
DAIŞ`ê



>>>> R:6

Çiya û Bajar peyman nû kirin



>>>> R:3

Sergotar

Dijminê derekî, nê`imeteke Xwe- dayî

N: Kerîm Perwîzî

Ji bo hikûmetên ser heya binî gendelkar ên wekî rejîma Wilayeta Feqîhî, dijminê derekî wekî hewcehiyeke haşahilnegir e ku rejîm dikare sedemekê bibîne ji bo mana xwe û veşartina gendelkariyên xwe.

Di vê demê de ku di şerê di navbera Îran û Îraqê de Xomeynî ragehand ku şer nê`meteke Xwedayî ye, hindê kes li ser vê baweriyê bûn ku vê rejîmê baweriyê zêde bi cîhana din heye, û mijûlî belavkirina mergdostiyê ye, û bi navê buhiştê mijûl e ku “Elwan” dibe “Elrêda”! Lê wateya rastîn ya vê hevoka Xomeynî di cihekî din de bû. Rejîma Wilayeta Feqîhî, ew rejîm e ku di nava kirîzan de dijî, û bi kirîz û tevdanîkariyan vedigeşe, û ew hinda ku agir di herêmê de geş dibe, rejîm jî zêdetir dikare bi destêwerdan û xwêtêxizandinê, bîr û hizra şerxwaziyê di herêmê de vegeşîne.

Ji aliyekî din ve, rejîma dîktator a wekî Wilayeta Feqîhî li ber gendelî û talanên bêqas ên berpirsên xwe nikare serwet û samana welat bo asûdeyiya jiyana xelkê dabîne, û aboriya welat berew herifîna yekcarî dibe. Her di wê demê de, wan cure rejîma hewcehiya wan bi vê heye ku tirseke hertimî bixin nava dilê xelkê de, ku dijmin û neyarên Îranê û Îraniyan, eva di nava pîlanan de ne ku Îranê qet-qet bikin, û malên xelkê welat wêran bikin!

Her wekî rejîma paşatiyê digot, ku bi nemana paşa, Îran dibe Îranistan. Rejîma Wilayeta Feqîh jî dibêje ku bi nemana vê rejîmê, Îran dibe

Partiya Sosyalîst a Kurdistanê û PDKÎ civiyan



Şandeke Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK)ê serdana PDKÎ kir û li ser çend pirsên derheq rewşa Kurd bi taybet hîlbijardinên Kurdistanê Bakûr û Tirkîyê nîqaş kirin.

Roja Pêncşemî rêkefta 15`ê Xakelêweya 1398`an (4`ê Nîsana 2019`an) şandeke Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK), bi serokatiya “Mes`ûd Tek”, serokê giştî yê “PSK”ê serdana PDKÎ kir, û ji aliyê heyeteke PDKÎ bi serperestiya “Mistefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê civînê de, di destpêkê de, “Mes`ûd Tek” tevî spaskirina ji pêşwazîkirina germ a PDKÎ, axavtinek derheq rewşa siyasî a Kurdistanê Bakûr û dawîn encamên hîlbijartinên şaredariyan li Tirkîyê pêşkêş kir, û beşên cuda yên vê mijarê dane ber hev.

Piştîre Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, basek derheq rewşa Îran û herêm û “Rasan” a Rojhilat pêşkêşî amadebûyan kir.

Herwisa di vê hevdîtinê de, her du aliyan tevî pêdagirîkirina li ser parastina berjewendiyên neteweya Kurd di hemû parçên Kurdistanê, û hewcehiya ber bi pêşvebirina alîkarî û hevahengiyên di navbera hêzên siyasî yên Kurdistanê, bihêzkirina pêwendiyên dostane ên dualiyane bilind nîrxandin.

hezar qet! Di rewşeke weha de ye ku rejîma serberedayî û gendel a Wilayeta Feqîhî hewceiya wê bi dijmineke weha heye ku dijmineke derekî hebe, û ger dijmin jî nebe, dijminan ji xwe re berçav bigre, da ku hewcehiyên xwe pê bi dest bixe! Di mînaka herî nû de, rejîma dest li ser dest û talanker a Îranê, di hemberî lehiyê de bêçare ma, û çî ji desta nahê, û bona veşartina xemsariyên xwe û kêmasiyên xwe, û nezankariyên xwe, û gendeliyên xwe, hêcetan li Amerîkayê digre, ku dorpêçên Amerîkayê nahêle ku ew hawara qurbandiyên lehiyê de herin!

Ew îdia dîkin ku dorpêçên Amerîkayê bêbuha ne, û bi hêsanî dikarin wan dorpêçan dewr lêdin, lê di demên weha de dibêjin ku li ber dorpêçan nikarin, kesekî lehîlêdayî jî derbaz bikin! Ya rastî ew e ku ew rejîm li ber gendelî û vegeşandina terorîzmê, serweta welat bi tewahî heder daye, û bi salan e ku hemû bajarsazî û sedsazî û avedankirinek di qorixa Spahê û bandên mafyayî ên nava rejîmê de ye, û serbarê vê yekê jî tu îmkanatek bo rewşên neasayî ku karesatên xwezayî rû didin nedaniye.

Di vê demê de ku lehiyeke mezin hatiye, nezanî û neşiyaniya rejîmê bi tewahî eşkere bûye, û bona veşartina şikest û abrûyê xwe, hawara xwe dibin ber hêcetên bê binge, bona vê ku Amerîkayê bi tawanbar bidin zanîn!

Rast di rewşeke weha de ye ku rejîma Îslamî a Îranê diselimîne, ku berdewam hewcehî bi dijminekê heye, û di vê demê de Xamineyî ret dike, ku dijminteraşî xirab e!

Barana zêde ya çend rojan ku dikare lehiyeke mezin çê bike, û belayek mezin jê çê be, diselimîne ku ew rejîm gellek bê binge û lertzoktir ji vê ye ku nîşan dide, û tenê pêleke bihêz dikare koşk û telarên wê ser hev de biherifîne.



»»» Doma Manşetê

Rêûresma 10`ê Xakelêweyê, salroja Şehîdên Kurdistanê, bi beşdariya Lêpirsyarê Giştî, kadr, pêşmerge û malbatên PDKÎ li binkeya serekî a PDKÎ bi rê ve çû.

Di beşa yekem a vê rêûresimê de, rêja leşkerî a pêşmergeyên Kurdistanê, ber bi cimata şehîdan dest pê kir, û sirûda “Ey Şehîdan” ji aliyê Hêza Pêşmerge ve hate xwendin.

Piştê Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, digel Behar Rostemî hevjinê şehîd Mêhdî Tewrîwerî û herwisa Kinêr Mêhfer hevjinê şehîd Resûl Mihemedzade, tacegulek li ser mezarê şehîd Seyîd Selam Ezîzî danîn. Piştê pêşnageha wêneyan ji aliyê “Mistefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ û Elî Xeforî pêşmergeyê PDKÎ ve bo amadebûyên vê rêûresimê hate vekirin. Her bi vê boneyê ve, Komîsiyona Komelayetî a PDKÎ jî peyamek belav kir, ku wiha ye: “Deshilata dîktator hemû hêz û hewla xwe xiste kar, û bi baldan li rewşa siyasî a navdewletî ku li gorê bû, şiya piştî 11 mehan, wê Komara pirr ji serbilindî û serbestî ji nav bibe”.

“Ew bi vê xeyalê ku, hemû nifşên Komarê û hizra azadîxwaziyê, di nav mêjîyê Kurdan de ji nav bibin, li roja 10`ê Xakelêweya 1326`an (31`ê Adara 1947`an), avaker û serokê Komara Kurdistanê, Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî îdam kirin”.

Di beşek din a vê peyamê de hatiye ku: “Rasan wekî piroseyeke hemû alî, eqlanî, exlaqî û siyasî ye, ku bi baldana bi rewşên navneteweyî, herêmî, û berçavgirtina xwastek û hêviyên xelkê, û cangorîkirina pêşmergeyên qehreman, û piştevanîkirin ji xelkê, heya asteke gellek baş kariye li zeqkirina hêza mirovî û potansiyêla şoreşvanên Rojhelatê Kurdistanê, bibandor be, û bibe gotareke zal di panahiya xebata siyasî û medenî a takên civakê de”.

Herwisa roja 11`ê Xakelêweya 1398`an jî, rêûresmek bi boneya bilindragirtina roja 10`ê Xakelêweyê, salroja bidar vekirina “Pêşewa Qazî Mihemed” û hevalên wî, ku wekî roja “Şehîsên Kurdistanê” hatiye binavkirin, bi amadebûna hejmerek ji endamên Navenda Siyasî, Desteya Kargêrî ya PDKÎ, kadr, pêşmerge û malbatên serbilnid yên şehîdan di binkeya Cêjnîkanê de bi rê ve çû.

Rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî a “Ey Reqîb” û ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji riha pak a şehîdên Kurdistanê dest pê kir. Piştê peyama Desteya Kargêrî a PDKÎ bi boneya roja 10`ê Xakelêweyê, ji aliyê endamê Desteya Kargêrî “Kerîm Perwîzî” ve hate pêşkêşkirin. Herwisa di beşeke din a vê rêûresimê de, helbesta bi navê “Beyanî Hez” ji aliyê helbestvan “Bêbeş Pîrotî” bi boneya bîranîna şehîdan hate pêşkêşkirin, û piştê sirûda bi navê “Daye megrî” ji aliyê pêşmergeyê dengxweş yê hizbê “Osman Rehmanî”ve hate pêşkêşkirin. Di beşeke din a vê rêûresimê de, sirûda bi navê “werin biçin ser gorî şehîdan”, ji aliyê sê pêşmergeyên xebatkar yên hizbê, yên bi navên “Siyamend Şabûyî, Luqman Seyîdepûr û Nadir Azer Berzîn” ve hate pêşkêşkirin.

Herweha Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê jî di peyamekê de, derheq 10`ê Xakelêwe roja Şehîdên Kurdistanê ragehandiye: “Niha paş derbazbûna zêdetir ji heft dehikan ku bi ser bidarvekirina Pêşewa û hevalên wî re derbaz dibe, em dibînin ku tevgera Kurd bûye fakter- eke bihêz ya xebat û tekoşîn bo azadî û demokrasiyê di Îranê û navçeyê de. Bîr û hizra neteweyî û azadîxwazane li raserî Kurdistanê de bi şeweya herî baş û bilind xwe nîşan dide.

Îro rojê civaka Kurdistanê guherî ye û bûye civakeke çendalî û pêşkevî û piloral û çend hizbî. Lê hemû hizb û rêxistinên nîştimanî û demokratîk û azadîxwazên Kurdistanê serbarê cudahya siyasî a di navbera xwe de rêz ji Komara Kurdistanê û armancên wê digrin.

Eva nîşanderê vê ye ku Pêşewa Qazî Mihemed û armancên Komara Kurdistanê, ne tenê her milkê hizbeke diyarîkirî nînin, belku nîşana hevpar a kultura siyasî û azadîxwazane ya xelkê Kurdistanê û hizbên xebatkar ên ser qada xebatê ne di Kurdistanê de. Pêşewa Qazî Mihemed çî di dema ragehandina Komara Kurdistanê de, û çî jî di wesiyetnameya xwe de wekî rêberekî neteweyî û dilsoj û şareza pêdagiriyê li ser vê yekê dike, ku xebatkarên gelê Kurd hewce ye ku di hemberî dijminên Kurdistanê de bihêz û yekgirtî bin, û di navxwe de jî, û digel hevdu nerm û dûrbîn û bêhnfireh û bitehemul bin”.

Peyama Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê derheq 10`ê Xakelêweyê

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê di peyamekê de, derheq 10`ê Xakelêwe roja Şehîdên Kurdistanê peyman digel rêbaza şehîdan nû kir.

Deqa peyamê:

Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!

10`ê Xakelêweyê roja bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed serkomarê Kurdistanê û Sêdrê Qazî û Mihemed Husênxanê Seyfê Qazî ye.

72 sal berî niha di rojê wek îro de, Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê dewleta Cîmhuriya Kurdistanê, di Çarçiraya bajarê Mehabadê, ji aliyê rejîma paşatiyê ve hate bidarvekirin. Çend rojan piştê jî hejmareke din ji efserên Spaha Millî ya Kurdistanê û karbidestên din ên Hikûmeta Kurdistanê li navçeyên Seqiz û Bokanê hatin bidarvekirin.

Bi vî rengî rejîma Mihemedrîza Şah, piştî vê ku di encama gelekomeyêke navneteweyî de, karîbû Komara Kurdistanê ji nav bibe, bi armanca serkutkirina tevgera mafxwazane ya xelkê Kurdistanê, pêleke berfireh ya îdam û kuştin û girtin û şopandin û zext û givaş di Kurdistanê de dest pê kirin.

Karbidestên dewleta Tehranê li ser vê baweriyê bûn ku bi vî karî dikarin bîra azadîxwaziyê bo her tim ji nav bibin, lê herwek ku Pêşewa di dema bidarvekirinê de rû li dagîrkeran ragehand: “Bi kuştina min bîr û hizra kurdîtiyê û azadîxwaziyê di Kurdistanê d, ne tenê ji nav naçe, belku di siberojê de bihêztir jî dibe”.

Bûyerên piştê rewayiya vê gotina hekîmanê ya Pêşewa selimandin, ku gelê Kurd ne tenê her

dest ji xebat û berxwedan û armancên Komara Kurdistanê hilnegirt, belku armancên Komara Kurdistanê bûne îlhambexşê (sembola) xebat ji bo azadî û rizgariya neteweya Kurd li ser-taserî herêmê de. Heta ew hemû serkut û zext û givaşa ku Komara Îslamî wek mîratgirê biheq ê rejîma paşatiyê di heyama deshilata reş a xwe de li dijî gelê Kurd bi kar aniye, bi xebata yekgirtî a siyasî û medenî a xelkê Kurdistanê bersiveke tund pê hatiye dan.

Eva ye ku îro li her çar parçeyên Kurdistanê de xebat bo rizgariyê bi awayên cur bi cur dom heye. Niha paş derbazbûna zêdetir ji heft dehikan ku bi ser bidarvekirina Pêşewa û hevalên wî re derbaz dibe, em dibînin ku tevgera Kurd bûye faktereke bihêz ya xebat û tekoşîn bo azadî û demokrasîyê di Îranê û navçeyê de. Bîr û hizra neteweyî û azadîxwazane li raserî Kurdistanê de bi şeweya herî baş û bilind xwe nîşan dide.

Îro rojê civaka Kurdistanê guherî ye û bûye civakeke çendalî û pêşkevî û piloral û çend hizbî. Lê hemû hizb û rêxistinên nîştimanî û demokratîk û azadîxwazên Kurdistanê serbarê cudahya siyasî a di navbera xwe de rêz ji Komara Kurdistanê û armancên wê digrin.

Eva nîşanderê vê ye ku Pêşewa Qazî Mihemed û armancên Komara Kurdistanê, ne tenê her milkê hizbeke diyarîkirî nînin, belku nîşana hevpar a kultura siyasî û azadîxwazane ya xelkê Kurdistanê û hizbên xebatkar ên ser qada xebatê ne di Kurdistanê de. Pêşewa Qazî Mihemed çî di dema ragehandina Komara Kurdistanê de, û çî jî di wesiyetnameya xwe de wekî rêberekî neteweyî û dilsoj û şareza pêdagiriyê li ser vê yekê dike, ku xebatkarên gelê Kurd hewce ye ku di hemberî dijminên Kurdistanê de bihêz û yekgirtî bin, û di navxwe de jî, û digel hevdu nerm û dûrbîn û bêhnfireh û bitehemul bin.

Em wekî Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistanê Îranê di pêxema ber bi pêşvebirina armancên xelkê Kurdistanê de, pêkve li ser hevkarî û hevdengî û hevxebatiya digel hevdu pêdagiriyê dîkin, û peymanê digel riha pak ya Pêşewa Qazî Mihemed û hemû şehîdên riya azadî û rizgariya xelkê Kurdistanê nû dîkin, ku alaya xebata wan heya serkevtinê bilind û bipêl ragirin.

Silav li riha pak ya Pêşewa Qazî Mihemed û hemû şehîdên riya azadî û rizgariyê!

Silav li armancên Komara Kurdistanê!

Silav li xelkê Xebatkar ê Kurdistanê!

**Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistanê Îranê
9-ê Xakelêweya sala 1398-an a Rojî**



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties

مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Serkomarê Kurd Qazî Mihemed namire



Bûbê Eser

Ez bawer nakim ku li vê cîhanê tu miletan, tu xelkan bi qasî Kurdan, ji bona azadiya gelê xwe bedel dane. Bê hejmar cangoriyên vî miletî hene.

Bi sedan rêber, serok û pêşewayên wan hatin bi-darvekirin. Bi hezaran kes û kesayetiyên vî miletî ji aliyê dagirkeran ve hatine windakirin.

Lê dîsa jî ne bawer im tu miletan jî bi qasî miletê Kurd berxwe dane, serî li hember zilma dagirkeran netewandin. Ji bona azadî û serxwebûna gelê xwe, her di nava tekoşînê de bûn û wê bibin.

Bi vê ked û xebatê bi rêbertî û serokatiya nemir Qazî Mihemed Komara Kurdistanê li Rojhilata Kurdistanê di sala 1946-an de hate damezrandin, ku paytexta wê Mehabad bû.

Belê hate damezrandin, lê wê demê ji bilî dagirkerên me, hema bêjin hemî cîhan dijminê Kurdan bûn, û di nava wan de yê sereke jî ew soviyeta ku digot; "Em mafê gelan diparêzin" bû.

Ji bona komara Kurdistanê bê hilweşandin, çi ji destê wan hat, kirin heta ku ew komara dilê Kurdan, ku hebûna Kurdan bû, hilweşandin.

Serokê nemir Qazî Mihemed bi zanebûn û têgihîştina xwe, bi bîrewerî û cesareta xwe, bi tekoşîn û tekoşerîya xwe bo me Kurdan Komara Kurdistanê damezrand.



Ji ber vê divê Kurd tim wî û tekoşîna wî ya li hember dijmin bi bîr bînin. Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê Kurdistanê bû.

Lê piştî cîhan li ser serê Kurdan bûne agir, bi alîkarî û piştevaniya Rûsan û hin dewletên din, Komara Kuistanê piştî salekê hate hilweşandin.

Piştî hilweşandina Komara Kurdistanê, li Kurdistanê ji nû ve, kuştin, talankirin, û wêraniyê, dest pê kir.

Kurdistana şêrîn kirin weke warê bê kesan, rêber û berpirsên Kurdan yek bi yek girtin û darve kirin, kuştin û winda kirin.

Ji bona dagirker bi temamî miletê Kurd tune neke, Kurdistanê bi temamî wêran û xerabe neke, Pêşewa Qazî Mihemed mecbûr ma ku xwe ji bona gelê xwe, ji bona welatê xwe, xwe kir cangorî.

Wî jî baş dizanîb û ku heger ew xwe radestê dijminê bê bext bike, wê wî bi darve bike. Li gor vê zanebûnê jî ji bona parastina miletê xwe, û axa welatê xwe, xwe kire cangorî.

Divê hemî Kurd xwedî li tekoşîna nemir Qazî Mihemed derkevin, wî di dilê xwe de bi cih bikin, ji bona tekoşerîya wî spasdarî wî bin.

Belê dijminê me baş dizanin ku miletê Kurd girêdayî serok û rêberên xwe ne. Çi dema ew serok û rêber bêne kuştin, darvekirin, windakirin, weke milet jî Kurd ji qudûm dikevin. Ji ber vê bû dagirkerên Îranê her xwestin ku Qazî xwe radestê wan bike, da ku wî bidar vekin, û tekoşîna gelê Kurd bitemirînin. Her weha jî bû. Lê wê temirandinê, wê bédengiyê, heta heta nedomand. Niha neviyên wî dixwazin û xebat dikan ku wê ala Qazî bilind kiribû, hilgirên wê, nexin erdê, berxwe didin, û wê bidin heta wê daxwaza Pêşewa ya Kurdistanê azad û serbixwe damezrînin.

Ez nemir Qazî Mihemed, pêşewayê gelê Kurd, bi bîr tînim, û serê xwe li ber tekoşerîya wî ditewînim, û ji neviyên wî yên niha li ser rêya wî, ji bona azadiya Kurdistanê berxwe didin jî, serketinê dixwazim.

Belê nemir Qazî Mihemed û rêhevalên wî Seyfê Qazî û Sadrê Qazî piştî dadgeheke nehu-qûqî di roja 31. 03. 1947-an de li Meydana Çarçirayê hatin darvekirin. Lê ew û hemî hevalên wî di dilê her Kurdekî de dijîn û wê bijîn.

Siberoja HSD`ê piştî DAIŞ`ê



N: Paul Iddon

Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) roja 23ê Adarê piştî ku Baxoz kontrol kir, serkeftina xwe bi ser xelafeta DAIŞ`ê de ragihand. Niha pirsyar ev e ku çarenivîsa HSD`ê ya bi serokatiya Kurdan, dê çi bibe?

HSD di şerê têkberina xelafetê de nêzikî 11 hezar şervan ji dest dan, du qat ji vê hejmarê jî birîndar bûn. HSD di şerê têkberina dorpêça Kobanî de di payîza 2014an de dest pê kir û piştî xwe di kontrolkirina Reqaya paytexta xelafetê de dît, piştî wê jî bi piştewaniya Hevpeymaniya Navdewletî ya bi serokatiya Amerîkayê deverên bin destê DAIŞ`ê kontrol kirin.

HSD`ê îsbat kiriye ku li Sûriyê hêza piyade ya herî bipabend û herî pêbawer e. Alîkariya Waşingtonê ji bo HSD`ê li ser bingeha pêwîstî û karê dualî ye, bi taybetî li ser bingeha têkberina DAIŞ`ê ye. Niha jî, ku HSD têkberina temamê xelafetê ragihandiye, siberoja Rêveberiya Xweser careke din dibe cihê pirsyarê. Serokê Amerîkayê Donald Trump di Kanûna sala derbasbûyî de ragihand ku dixwaze hemû hêzên Amerîkayê ji Sûriyê vekişîne, piştî razî bû ku 400 leşker li Sûriyê bihêle.

Tê çaverêkirin ku heta demekê li Sûriyê bimînin, ji ber ku hevpeymanan ew bi xwe jî li xwe mikur hatine ku têkberina xelafeta DAIŞ`ê nayê wateya têkberina DAIŞ`ê. Hevpeymanan demeke kin piştî ragihandina HSD`ê ya serkeftina li Baxozê, di peyamekê de ji dezgehên medyayê ye re diyar kirin ku “Hevpeymaniya Navdewletî karên xwe yên li gel hevbeşên xwe yên Hêzên Sûriya



Demokratîk (HSD) berdewam dikin, alîkarî jî didin daku şiyana wan hebe garantiya wê yekê bidin ku DAIŞ bi awayekî yekcarî ji nav çûye, bala me li ser têkberina îdeolojiya DAIŞ`ê ye jî”.

Niha xelafetêk çûye û dibe ku HSD bi operasyonên rûbirûbûnê şerê dijî paşmahiyên DAIŞ`ê bike. Ji bo ku HSD bikare operasyonên bi vî rengî bi awayekî serkeftî bike, divê peywendiyê baş li gel eşîrên Erebb ên wê deverê çêbike.

Di dawiya 2018an de îdiaya nerazîbûna hinek eşîrên wê deverê hebû, li Reqayê daxuyaniyek belav kiribûn ku têde eşîrên din han didan ku dawî li hevkarîyên xwe yên li gel wan hêzan bin ku Kurd serokatiya wan dikin. Ev geşedan dikare di siberojê de rêzên HSD`ê ji hev biqetîne û seqamgîriya wan beşan li Sûriyê têk bide, bêguman ev jî dê di qezenca şaneyên razayî yên DAIŞ`ê de bin.

Piştî têkçûna xelafetê, guvaşên Tirkîye û hikûmeta Sûriyê li ser HSD`ê zêde dibin. Rejîma Sûriyê, Îran û Rûsya bi tundî li dijî hebûna leşkerî ya Amerîkayê ne û daxwaza vekişîna hemû hêzên Amerîkayê ji deverên bin kontrola HSD`ê û binkeya Tenefê ya li başûrê Sûriyê kirine. Rûsya amaje bo wê yekê jî kiriye ku hikûmeta Şamê divê hemû deverên bin desthilata HSD`ê werbigre.

HSD di çendîn minasebetan de tekezî li wê yekê kiriye ku naxwazin li gel Şamê tûşî şer bibin û bi awayekî berdewam piştigiriya danûstandinan dikin. Du mercên wan jî ji bo danûstandinan hene; nasîna yasayî ya otomî û parastina HSD`ê. Bi wateyeke din, ew pêgeha ku ew dixwazin heta radeyekê weke wê ye ku Herêma Kurdistanê û hêzên Pêşmerge li Iraqê hene.

Dema şahiya serkeftina bi ser DAIŞ`ê de, Mezlûm Ebdî (ku bi navê Mezlûm Kobanî tê nasîn) li kêlgeha petrolê ya El Umer daxuyaniyek xwend ku têde ji Şamê daxwaz kir ku wan mercan qebûl bike û rêz li wan bigre û dest bi danûstandinan bike.

Şam ji aliyê xwe ve tekezî li ser wê yekê dike ku dê hemû welat bigre destê xwe. Niha Tirkîye li wir rawestiyaye. Piştî ku Tirkîyê êriş kire ser Kantona Efrînê, Serokomarê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan gefa êrişkirina ser Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ên li Minbicê û deverên rojhilatê Firatê xwar. YPG hêza herî giring a di nav HSD`ê de ye.

Havîna derbasbûyî, Amerîka ji bo çareserkirina aştiyane ya rewşa Minbicê li ser nexşerêyek li gel Tirkîyê li hev kir. Waşingtonê soz da ku endamên Encûmena Leşkerî ya HSD`ê li Minbicê biguherîne ku niha jî wî bajarî birêve dibin. Tirkîye li ser bingeha rêkeftina 2016an a li gel Amerîkayê, li dijî hebûna hêzên YPGê ya li herêmê ye.

Rûsya jî ji HSD`ê re gotiye ku eger Amerîka hêzên xwe ji Minbicê vekişîne, ew dê demildest hêz bişînin daku rê li ber êrişa Tirkîyê ya bi ser wî bajarî de bigrin. Xuya nake ku Tirkîye di van demên nêzik de êrişî Minbicê bike, ji ber ku berevajî rewşa Efrînê, ihtimal kême ku Rûsya lembeya kesk jê re vêxe, yan jî Amerîka rîza-mendî nîşan bide.

Ji aliyekî din ve jî ihtimal kême Enqere êrişeke mezin bi ser deverên rojhilatê Firatê de bike, ji ber ku Amerîka hêzên xwe li wan deveran dihêle, her çiqas hejmara wan kême bike jî.

Di meha Sibatê de Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) ragihand ku piştî têkberina DAIŞ`ê bala xwe dê bidin ser rizgarkirina Efrînê ji destê dagîrkeriya Tirkîyê û vegeandina bajêr bo niştecihên xwe yên resen ku niha nêzikî 100 hezar kes li kampên awareyan ên li herêma Şehba niştecih in.

Lê belê heta niha ne diyar e ku HSD dixwaze çawa wê yekê bike. Tiştê xuya dike ew e ku HSD dê rûbirûyî dijiwariyeke mezin bibe, ew asteng jî rê li ber ragirtin û bihêzkirina wan destkeftan digre ku bi zehmetiyeke mezin bi dest xistine.

Nerîna Lîderan



“Mike Pompeo”:

“Hekî em alîkariya Erebianê nekin, tê vê wateyê ku em Yemenê didin rejîma Îranê”.



Nêçîrvan Barzanî:

“Divê mamoste û xwendekarên Kurd Koçer Bîrkar ji xwe re bikin mînak”.



Behram Qasimî:

“Dewleta Amerîkayê berpirsyarê encamên xirab ên lehiyên di Îranê de ye”.



Eî Xamîneyî:

“Karekî bikin ku hêzên Amerîkayî bilez ji Îraqê derkevin”.

“Mik Pompeo”: Amerîkayê pîlanên mezin bo pêşgirtin ji gefên rejîma Îranê hene

Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayî di gotûbêjekê de got Amerîkayê pîlanên mezin bo pêşgirtin ji gefên rejîma Îranê hene.

“Mik Pompeo” Wezîr Karê Derve yê Amerîkayê di gotûbêja derheq fikr û ramanên 2019`an digel Navenda “National Review” de got, ku rejîma Îslamî a Îranê mezintirîn gef e li ser aramî û ewlehiya deverê, û Wezareta Karê Derve a Amerîkayê jî bo kêmkirina hêza vê rejîmê bo afirandina alozî û arîşeyan di deverê de, bernemeyên mezin bi alîkariya Wezareta Xezînedarî û herwisa Wezareta Berevaniyê a wî welatî rêk xistine.



Herwisa navbirî got, rejîma Îslamî a Îranê, bi piştevanîkirin ji girûpên wekî “Husiyên Yemen, milişên Şî`e meseb li Îraq, Hizbulaha Lubnan, û dewtela Sûriyê, û aloziyên zêde yên li Sûriyê rol hebûye, û navbirî got Amerîka bi darêtina bernemeyên wiha, hewl dide da ku bandora kiryarên rejîma Îranê biguhere.

Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê derheq kirîza mirovî li Yemenê de got, di demekê de Erebian û Yekîtiya Erebi, alîkariyên mirovî yên zêde ji xelkê Yemenê re şandine, lê rejîma Îslamî a Îranê bi piştevanîkirina ji Husiyan, tu rolek di gihandin û dana alîkariyên mirovî tune bûye.

Herwisa wî berpîrsê Amerîkayî, rejîma Îslamî bi vê yekê tawanbar kir ku, ev rejîma di cihê vê de ku digel nûnerê taybet yê NY li gotûbêjên Yemenê de alîkar be, lê berecvajî, mûşkan ji girûpa Husiyên Yemenê re dişîne, da ku li dijî Erebianê bi kar bînin.

Amerîka, Îsra`îl û hin welatên Rojhilata Navîn, rejîma Îranê bi destêverdan di karûbarên welatan û herwisa têkdana ewlehiya deverê de tawanbar dikin.

Amerîka agehdarê kiryarên terorîstî yên Îranê di Ewropayê de ye

Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayî di gotûbêjekê de got: Rêberên rejîma Îranê, ji terorên ku li Ewropayê de tîn encamdan agehdar in, û îzin didin ku, ew kiryarên terorîstî li wir bîn encamdan.

“Mik Pompeo” Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê, di konferanseke rojnamevanî de got: Hewla rejîma Îranê bo encamdana kiryarên terorîstî di Ewropayê de berdewam e, û hemû rêberên rejîma Îranê nemaze Hesên Rohanî ku, serkomarê wî welatî ye, îznê didin da ku ew kiryarên terorîstî bîn encamdan.

Herwisa navbirî got: Min gellek caran jî gotiye ku, gefên rejîma Îranê çî ne, û gef gellek zêde ne, û daxwaz ji rejîma Îranê kiriye da ku, reftarên xwe weke welatên din asayî bike.

“Mik Pompeo” got ku em di gel hemû hevpeymanên xwe kar dikin, da ku gefên rejîma Îranê bê bandor bikin, û herwisa em ji aliyekî din ve jî, hin çalakîyên din di vê derheqê de encam didin, û dorpêçan disepînin, da ku rejîma Îranê bo encamdana kiryarên wiha, tu çavkaniyek berdest de nebe.

Roja Pêncşemî 8`ê Xakelêweyê (28`ê Adarê) “Mik Pompeo” Wezîr Karê Derve yê Amerîkayê di gotûbêja derheq fikr û ramanên 2019`an digel Navenda “National Review” de got, ku rejîma Îslamî a Îranê mezintirîn gef e li ser aramî û ewlehiya deverê, û Wezareta Karê Derve a Amerîkayî jî bo kêmkirina hêza vê rejîmê bo afirandina alozî û arîşeyan di deverê de, bernemeyên mezin bi alîkariya Wezareta Xezînedarî û herwisa Wezareta Berevaniyê a wî welatî rêk xistine.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê destxweşî li xelkê Kurdistanê kir

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê, di peyamekê de, bi boneya lidarxistina cejna Newrozê di Kurdistanê de, spas û pêzanîna xwe ji xelkê xebatkar yê Kurdistanê re nîşan da.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, bi boneya birêveçûna merasima Newrozê

Xelkê xebatkar û nîştimanperwer yê Kurdistanê!

Her wek bo hemiyan rohn û eşkereye, Newroz nûbûna sal û dawîhatin bi demsala serr û seqemê û destpêkirina jiyaneke nû bo mirov, jîndar, dar û çiya ye, lê, bo me Kurdistanîyan Newroz sembola roja serîrakerin û roja serkevtina azadiyê bi ser seqema bindestî û zordariyê de ye.



Di Kurdistanê li jêr destê zilma Komara Îslamî de, îsal jî Newroz bû bi hêvîna tebahî û birayetiya neteweyî, û xelkê Kurdistanê bi hemû çîn û texên civakê û bi bê liberçavgirtina dever û bîr û bawer, ol û mesebên coda bi pêşwaziya bangeşeya Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê hatin û we nîşan da ku xelkê Kurdistanê û Partî ji li yek coda nînin, û herçavan di heyam 6 mehên borî de xelkê Kurdistanê ducar (21`ê Xermanana 1397`an li rêûresimên Newroza 1398`an) selmand ku siyasetên kuştin û bidarvekirina girtiyan di heyama 40 salên borî de, ku ji aliyê dezgehên serkutkar yê Komara Îslamî derheq xelkê Kurdistanê hatine encam dan, nekariye li ser îradeya neteweyî a gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, zal be û xelk û partî li yektir dûr bike.

Xelkê xwedî îrade û mandînenas yê Kurdistanê

Di rêûresimên Newrozê de li gund û bajaran, li kolan û şeqam û çiya û zeviyan de we selmand ku çi hêzeke mezin û çi şevqeke mezin bo rizgariya nîştiman di nav dilê ve de heye.

We bi yekgirtîbûna xwe dîlana azadiyê lidarxist û bi Cemedanî û Hewrî û golên sor çavên dagîrkaran kor kirin. Newroza îsal her rêûresimên xweşî û şahî nebûn, belkû nimayêşa hêza mezin a gel û Kurdistanê bû, ku tevî gefxwerin û zor anîna rejîmê û anîna hêza leşkerî bo bajar û şeqam û sînoran, we karî rêûresimên Newrozê mezintir û bi panahiya Kurdistanê birêve bibin.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê, tevî destxweşî gotina bi bivêrî bûna we, wê serkevtina mezin ji we pîroz dike, ku we nîşanda hûn pêşnegin di şoreş û sekinîna li hemberî zilma zaliman de, we selmandiye ku tevgera rizgarîxwazî a Kurdistanê, pêşnege di cora xebata medenî de, û em wekî Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê soza û qewlên xwe digel we nû dikin ku, îsal pêngavên mezintir ber bi yekgirtin û yekdengiyê hilbigirin

Bêguman bideng hatin û coş û keyfxweşî hêviya ve bo yekrêziyê bê bersiv nahêlên û hemû hewlên xwe di vê derheqê de didin.

Mirin û neman bo Komara Îslamî a Îranê

Serkevtî be Tevgera Rizgarîxwazî a Kurdistanê

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê

5`ê Xakelêweya 1398`a

Bînasaziyên şaş sedema zirarên lehiyê ne

Wezîrê Rê û Bînasaziyê yê rejîmê got, bînasaziyên şaş sedema zirarên bûyerên lehiyê ne.

Roja Pêncşemî 15`ê Xakelêwe (4`ê Nîsan)ê, Mihemed Îslamî Wezîrê Rê û Bînasaziyê yê rejîma Îslamî a Îranê di civîna heyeta dewletê de got, bi avadaniyên şaş li ser riya herikîna lehiyê, herwisa paqijnekirina rûbaran sedemên zirarê gihandina gund û bajarên Îranê ne.

Wî Wezîrê Rê û Bînasaziyê got bînasaziyên welat bo lehiyeke bi wî qasî bihêz nehatine çêkirin, herwisa got pîraniya rûbaran nehatine paqijkirin, hekî paqij kirbana, wiha nedibû, û hejmarek pîr herifîne, çimkû avê di hemû aliyan de derbe lê xistine, û bingehên pîra pêka zanista endazyariyê nehatine çêkirin, û derheq alav û çêkirina van de xemsarî hatine kirin.

Wî Wezîrê rejîmê di gotûbêjeke medyayî de got, hêza wêranker a lehiyê bi sedema girtûbûna cihê herikîna avê, wekî bûyera bajarê Şîrazê bû. Me li ser riya avê avahî û rêyên hatûçûnê çê kirine, û bi herikîna lehiyê, hevvelatî zirarên canî û malî ber ketin, û hekî me ev der aloz nekirana, ev yek nediqewimî.

Herwisa navbirî got pîraniya hewcehiyên zanistî û taybetî di bînasaziyên Îranê de nehatine berçavgirtin, û pîraniya rê, cade û pîr, gellek nizim hatine avakirin, ku di heyama rabûna lehiyê de bi hêsanî dikevîne bin avê.

Li gorî gotina Wîzêrê Rê, rabûna lehiyê di heyamên borî de, riyên hejmareke zêde ji gundan wêran kiriye, û herwisa di 500 noqtan de herfina çiya hebûye û 5 hezar avahî bi sedema lehiyê dibe bîn avakirin yan jî nûkirin. Piştî vê bûyera xwezayî hemû gendelî û xemsariyên berpirsên rejîmê derheq pêranegihîştin û dabîn nekirina hewcehiyan bo hevvelatîyan û herwisa avadannekirina welat êşkere bûye, û berpirsên rejîmê jî yek li pey yek îtiraf bi van xemsariyên xwe dikin.



Spaha Pasdaran sebebkarê vêraniya welate

Piştî barîna Barana zêde û rabûna lehiyê li çendîn parêzgehên Îranê, ku li pey xwe zirarên zêde yên canî û malî bi cih hêlase, zêde bûye ku sebebkarê zêdebûna xisaran, kar û pirojeyên şaş û nestandard yên Spaha Pasdaran bûne.

Her di vê derbarê de jî, piştî zirarên zêde yên bi hegera lehiyê, Spaha Pasdaran hate ser wê baweriyê ku hinek pirojeyên avadanî, wekî: Bendav, pire, rê û rêyên hesin ku berê ji aliyê Spaha Pasdaran bixwe ve hatibûne avakirin, dûr ji pîvanên standard in, û gellek cihan jî, li ser riya rabûna lehiyê hatine avakirin.

Lewra ev 2 roj in, li ser daxwaza berpirsên Parêzgehan, Spah Pasdaran dest kiriye bi herifandina çendîn pîr, rê û riyên hesin û valakirina avahiyan di hinek li Şehrekan de.

Parêzgarê Parêzgeha Gulistanê bi awayekî fermî daxwaz ji Spaha Pasdaran kiriye, da ku rêyla tirênê biherifînin, lewra Spaha Pasdan jî riya asin teqandin. Herwisa li Kirmaşanê jî Spaha Pasdaran, dest kiriye bi teqandina pirekê.

Sedema zirarên zêde yên lehiya wan çend rojên derbasbûyî, para zef dizivire bo ser wan bendavan ku Spaha Pasdaran ava kirine.



Romaneke li ser êş û janên Kurdên Êzidî



Romana “Strana hişkayiya bêdawî” navê wê pirtûkê ye ku xwendevan bi çavên kurekî 13 salî di nav çiroka sed salan a çanda Kurdên Êzidî û jiyana wan a zehmet a dîrokê de geştê dikin.

Prof. Dr. Îlhan Kizilhan ku derûnnas e û xwedî çendîn

pirtûkên din e, ev romana xwe berî êrişa DAIŞê ya ser Şingalê nivîsandiye, lê weke ew dibêje “dîrok dubare dibe”.

Lehengê pirtûkê Rodî dema yek salî ye, bavê wî winda dibe û dayîka wî neçar dibe ku li gel kurê xwe biçin gundekî Kurdên Êzidî yê li Tirkîyê û li wir bijîn. Kizilhan behsa lehengê pirtûkê yê 13 salî dike û dibêje: “Ji ber ku ciwanekî 13 salî ye, dîtina wî ya dinyayê, şirovekirina wî ya dinyayê, ji ya mezinan cudatir e. Gelek tiştan fêhm nake û pir tiştan dipirse, di pirtûkê de dipirse çima wisa ye. Ji bo em karibin civaka xwe şirove bikin, ez bawer im bi dîtina ciwanekî 13 salî, dîtineke taybet tê afirandin.”

Navê romanê behsa êş û janê dike ku di dilê hemû Kurdên Êzidî de heye û ti car bi dawî nabe. Nivîskar dixwaze bi zimanê Almanî ji aliyekî ve 200 hezar Kurdên Êzidî yên li Almanyayê dijîn, çand û dîroka xwe binasin û jibîr nekin û ji aliyekî din ve jî welatîyên Almanî ola Êzidiyan û trajediyên ku hatine serê wan bizanin.

Prof. Dr. Îlhan Kizilhan dibêje: “Niha em dibînin gelek Êzidiyên Kurdistanê, bi taybetî Êzidiyên Başûrê Kurdistanê ji 2014an heta niha, zêdeyî 80 hezar mirov revîyan hatine Almanyayê, çûne Amerîkayê, çûne Awustralyayê. Kurdistan welatekî rengîn e, Êzidî parçeyeke ji Kurdistanê ne, Mesîhî parçeyeke Kurdistanê

ne, ew dilekî me ne, eger dilekî me kêmbibe, em ê nexweş bikevin. Ji bo Êzidiyan bi xwe jî, metirsiyeke gelek mezin e ku li diaspora nikaribin jiyana xwe weke Êzidî weke li Şingalê an jî li Kurdistanê bimeşînin û di nav sê – çar nîşan de li vê derê belav bibin û nasnameya Êzidîtiyê winda bibe. Ev cihê xemgîniyê ye, ji ber vê yekê hêviya me ew e ku li Kurdistanê bimînin û Êzidîtiya xwe li Lalişê li Şingalê di nav Kurd û Kurdistanê de bidomînin.”

Li Navenda Lêkolînê ya Kurd a li bajarê Bonnê, bi beşdariya Kurd û Almanan, Prof. Dr. Îlhan Kizilhan romana xwe weke awêneyeke nîşandana êş û janên Kurdên Êzidî xwend. Rudaw

Bengîn straneke taybet li ser Pêşmergeyên Kurdistanê amede dike

Hunermendê kurd ê ji Efrîna Rojavayê Kurdistanê Hikmet Cemîl ango yê bi navê Bengîn tê naskirin got ku ew straneke taybet li ser Pêşmergeyên Kurdistanê amede dike.

Hunarmed Bangîn di hevpeyvîneke taybet a Radyoya Rûdawê de ragihand ku ew niha mijûlê straneke taybet li ser Pêşmergeyên Kurdistanê dibe.

Bengîn, bi riya Rûdaw bang li hêz û aliyên siyasî yên Kurd kir, ku vê derfeta dîrokî ji dest xwe bernedî û nêzîkî hev bibin û ji tevahiya milletê Kurd jî hêvî kir, ku Kurdistan mijar û armanca wan be.

Hunermendê Kurd di hypeyvîna xwe de da zanî ku ji ber strana Zinara Erebi hukmê îdamê li ser wî heye got: “Hemû hunermendan mafê xwe birin, tenê êrîş li ser min têne kirin. Divê hunermend milkê millet be ne yê partiyan be.”

Hunermendê Kurd Bengîn ji xelkê Efrîna Rojavayê Kurdistanê ye, lê ew di sala 1962an de li Şamê ji dayik bûye.

Ji sala 1979an ve ji Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê derketiye û çûye Libnanê û di sala 1980yê de çûye Almaniya û ev bû 39 sal ku li derveyê welatê xwe jiyana xwe derbas dike.

Di sala 1986an de, bi sedema afirandin û belavkirina strana Zinara Erebi, li welatê Sûriyê û Iraqê hukmê bidarvekirinê (îdamê) di mafê wî de derketiye, û heta niha jî ew hukm li Sûriyê li ser wî heye, lê hukmê li Iraqê bi hilweşandina desthilatdariya hikûmeta Beis re, hilweşîya û li ser wî nemaye.

Heta niha 6 albûmên hunermend Bengîn yên tomar kirî hene û bi dehan stran û vîdyokilîpên wî hene.



Tabloya şewekarekî Kurd li Brîtanyayê bû yekem

Hunermendekî Kurd ê Şewekar ji nav hunermendên 40 welatan, xelata yekemîn a pişbirkêyeke navdewletî bi dest xist, ku ji aliyê rêxistina “Red Line Art Works” ve li welatê Brîtanyayê hatibû lidarxistin.

Hunermendê Kurd Dr. Azad Heme Şêxanî beşdarî bultena nûçeyên hunerê ya Rûdawê bû û li ser çawaniya beşdarbûna

pêşbirkê û bidestxistina xelatê, ragihand ku berî pêşbirkê di Kanûna 2018an de pêşangehek vekiriye ku çend tabloyên xwe pêşan dane, ji ber ku rojnamevanên navxweyî û herêmî wêneya tabloyên wî kişandine, jê xwestine ku ji bo beşdariya pêşbirkeke navdewletî ku ji aliyê rêxistina Red Line Art Works ve hatibû saz kirin, tabloyên xwe bişîne.

Dr. Azad Heme Şêxanî destnîşan kir ku hunarmedên 40 welatan beşdarî pêşbirka Red Line Art Works bûne û ev pêşbirk salane du car tê lidarxistin. Li ser çawaniya wergirtina xelatê, Dr. Azad Heme Şêxanî ku li Zanîngeha Tîşk mamoste ye, bi rêya e-mailê hatiye agahdarkirin ku xelata yekemîn a pêşbirkê bi dest xistiye û got: “Bi e-mailê pîrozbahî li min kirin ku tabloya min li jêr navê ‘The Ship of Diversity’ xelata yekemîn wergirtiye.”

Derbarê naveroka tabloyê de Dr. Azad Heme Şêxanî dibêje: “Tabloya ku xelat wergirt, behsa pirsgerêkên li ser erdê dike, koçberên cihanê siwarî wê keştiyê dibin, keştiyeke wisa ye ku milletên cuda yên cihanê li nav xwe kom kiriye, ku ji ber şerê DAIŞê û bilindbûna pileyên germahiya li ser erdê, ber bi welatên rojava koç dikin.”

Zimanê Kurdî

Bi gelemperî cînavê “çi” bo zelalkirin û destnîşankirina tiştan bikar tê : - Ev çi ye ? (Ev demjimêreke nûjen e) - Te çi kiriye ? (Min tiştê nekiriye) - Çi ketin ? (kevîr ketin) Lê carinan jî, ev cînav bo nasîna kesan bikar tê : - Tu çi kes î ? (Ez dêrikî me) - Mêvanên we çi kes in ? (mêvanên me Ereb in) Hindek caran, bo destnîşankirina giyanberan jî bikar tê : - Tu ji goştê çi giyanberî hez dikî ? (Ez ji goştê mîsî (masî) hez dikim) - Ev çi canewer e, çi teba ye ? (Ev hirçê nav berfê ye) Ev cînav di pêvajoya hevokan de, cihê navên demê jî digre : - Nuho em di çi demsalê de ne ? (Nuho em di havînê de ne) - Toşa Amûdê çi salê bû ? (toşa Amûdê sala (1937)ê bû)

Cînavê “çi” di hevokan de, weku navan dibe : 1- Kara (kiryar) : - Çi ket ? (Kevîr ket) - Çi şewitî ? (Dar şewitî)

2- Berkarê raster :
- Te çi xwest ? (Min av xwest) - Elî çi kirî ? (Elî pênuşek kirî)

3- Berkarê neraster :
- Ev dara çi ye ? (Ev dara belalûkê ye) - Tu ji çi goştî hez dike ? (Ez ji goştê masîyan hez dikim) - Hûn gihiştin çi encamê ? (Em gihiştin peymanê morkirî)

Carinan cînavê pirsîyarî “çi” jî çarçewa pirsîyariyê der dikeve û weku cînavê bêpirsîyarî bikar tê : - Ne xem e, çi hebe em ê bibînin.

Ev pênuş bi çi be jî, ez ê wê bikirrim
- Kî çi dibêje, bila bêje !

Pêrbestên (bo, ji bo) bi ser “çi” ya pirsîyarî vedibin û bi hev re bo zelalkirina sedema bûyîna karan tî xebitandin. Wek : - Bo çi tu ji gund hatî ? - Bo çi Fatê xeyidî ye ? - Ji bo çi Fatê digrî ? - Ji bo çi tu naçî gundê xwe ?

Gelek caran cînavê “çi” bi şeweyekî gelêrî dibe “çî”. Wek : - Ev mirov çî te ye ? - Ev kesên ha çî te ne ? - Çî Serdar şehîd ketiye ?

Bi dîtina min, ev “çî” jî pevxistina (çi + yî), anku (çi

+ yê, ya, yên) pêk hatiye. Wek : - Ev kurr çî (çi yî) te ye ? - Ev keç çî (çi yî) te ye ? - Ev kurr û keç çî (çi yî) te ne ? Helbet, ev “çî” ya ku ji (çi + yî) hatiye pevxistin û sivikirin bi şeweyekî gelêrî tê xebitandin. Çiku, li şûna (çi yî te ye ?) gerek (çi yê te ye ? çi ya te ye ? çi yên te ne ?) bikar bihatina . Hingê jî, pevxistina (çi + yê, çi + ya, çi + yên) nedibû “çî”. Hindek bêjeyên xwerû, wek : “ra, ma, lo, awa, hind, tov...” dighêjin cînavê (çi) û bi hev re cînavine lêkdayî saz dikin, Wek : “çira, çima, çilo, çawa, çend, çitov...”.

“Çira” (Çire) :

“Çira” yan jî, (çire) cînavê lêkdayî ye, ji (çi- ra, re) () pêk hatiye. Ev cînav bi şeweyekî pirsîyarî, doza sedema qewimandina bûyeran dike. Wek : - Çira tu nehatî çivînê ? - Şîrîn û Zîn çira ji hev xeyidî ne ? - Çira ev zarok digrî ?

Ji van mînakên dixuyê, ku “çira” bi wateya (çima, bo çi) hatiye. Anku, bo zelalkirina egera (nehatina çivînê), (xeyda Şîrîn û Zînê), (giriya wî zarokî) hatiye. Cînavê pirsîyarî (çira) cînavê neguhêrbar e, di hemû raweyên hevokan de wekî xwe dimîne .

“Çima” :

Cînavê “çima” cînavê lêkdayî ye, ji pevxistina (çi + ma) pêk hatiye :

- Çi : Cînavê pirsîyarî yî xwerû (sade) ye.
Wek : - Ev çi ye ?

- Ma : Bi dû coran tê :
1- Alaveke pirsîyarî bi wateya (aya, qey) bikar tê

Wek :

- Ma tu naçî dibistanê ?
(Aya tu naçî dibistanê ?)
(Qey tu naçî dibistanê ?)
Di vê mînakê de (ma) alaveke pirsîyarî ye, ne ku cînav e. Çiku, cihê tu navan nagire . 2- Li gora ku Seydayê zanyar Gêwê Mukriyanî, di firhenga “ kurdistan” de dibêje : ()
Di şewezarê “Pijderî” de (ma) bi wateya (bo, bo çi) bikar tê .

Dom heye...

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (347)

Çend wêne ji merasima Roja Şehîdên Kurdistanê

